HÛN BI
XÊR HATI
HÊLÎNA ME

# AGAHIYÊN GIRÎNG JI BO DÊBAVAN



Ein Kooperationsprojekt von:
AWO Landesverband Brandenburg e.V.
Landkreis DAHME-SPREEWALD

Unterstützung und finanzielle Förderung:
LAND BRANDENBURG
Ministerium für Bildung, Jugend und Sport

# Kesê pêwendîdar

Hêlîna me xwe dide nasandin

Birêvebiriya saziyê

Navnîşana saziya hilgir

Demên vekirî

Demên girtî

Rewşa temen Em zarokên ji temenê ______ heta ______ salî perwede dikin.

Hêlîna (baxçeyê zarokan) me li gor konsepta ______
kar dike. Agahiyên hûr û kûr hûn dikarin li konsepta me bibînin û bixwînin.

Zarokê/a we ji ______ ve diçe koma ______

Navên perwerdekarên wî/wê ______



Dema hînbûn/naskirina hêlînê li gor rewşa zarokê/a we ye. Di dema nûnaskirina hêlînê de pêşî kesek ji malbatê, li helînê bi zarokê re dimîne. Hûn dikarin derbarê wê zêdetir agahî li îlana destan bixwînin „Dema hînbûn/naskirinê – destpêk û binyata her hêlînekê“. Ev agahî wek pêvek lê zêdekirî ye.

Perwerdekar hewl didin ku zarên piçûk û mezin tecrûbeyên hevpar bikaribin çêbikin û tê re bandor li kemilandina hevdu bikin.

Ji bo her zarok portfolyo/dosyayek tê amadekirin. Tê de nivîsar, fotograf û xebatên zarokan hene. Ew nîşan dide zarokên we çi dikare û çi dizane û çi dixwaze fêr bibe. ji bo wî hûn gere erê bikin.
→ Beyana rizayê/rizamendî di pêvekê de ye.

Ji bo pêşnasîna rîzokeyên rewşa kemilîna zarokê, li hêlîna me enstrûmana „Kevirên sînor ên kemilandinê“ tê bikaranîn. Agahiya ji bo dêbavan „Kevirên sînor ên kemilandinê“ wek pêvek lê zêdekirî ye.

## Li hêlînê xwarin ji aliyê

- ☐ Fîrmaya xwarinê ______
- ☐ Ji aşxaneya hêlînê

pêk tê.

## Ji kerema xwe re wan tiştan ji bo zarokê/a xwe bînin:

- ☐ Şimik, li ser şimikan navê zarokê binivîsin
- ☐ Solên sporê, li ser solan navê zarokê binivîsin
- ☐ Kincên sporê di tûrek de
- ☐ Pîjameyek (guhertin her hefte)
- ☐ Hemû kincên yêdek di tûrek de, li gor demsalê
- ☐ Gava zarokê/a we pê xwe baştir hîs dike, mostik, lîstika herî baş a zarokê
- ☐ Kinc li gor hewayê (bo nimûne kincên baranê)
- ☐ Çat/pempers
- ☐ Pîneyên şil
- ☐ ______
- ☐ ______

☐ Hefteyê carekê roja lîstikê heye. Her zarok dikare lîstikek, ya ku zarok bixwe hilbijartiye, ji mala xwe bîne hêlînê. Ji kerema xwe re bala xwe bidin ku zarokê/a we tiştên biha, yan jî lîstik-debançe neyne hêlînê.

Roja lîstikan hertim

- ☐ duşem
- ☐ sêşem
- ☐ çarşem
- ☐ pêncşem
- ☐ înî

## Şertên qebûlkirina hêlînekê

Ji bo zarokên ku diçin helînê nameyeke bijîşkî hewce dike, ku ji bo çûna hêlînê ji aliyê doktor ve erêkirî be. Ev name **berê** ku zarok biçe hêlînê divê bê nîşandan. (§ 11 Absatz 2 qanûna hêlînê li eyaleta Brandenburg). Nameyên bijîşkiyê li ba doktorên zarokan peyda dibin, ew ji aliyê wan ve tên tijîkirin.



## Nexweşiyên zarokan ango nexweşiyên têger

Ji bo zarokên nexweş, alîkariya dêbav/welî û kesên ku ji bo wan girîng in, hewce dikin, ji bo saxî û silametiya wan, loma jî zarokên nexweş nikarin biçin hêlînê.
Rêbazên taybet ji bo dêbav û weliyan, li hember nexweşiyên têger çi ne, hûn ê li talîmatnameyê bibînin, → „Bi hev re ji înfeksiyonê biparêzin“. Ev kaxizê agahiyê di pêvekê de ye.

## Herika rojê li hêlîna me

Demên jêrîn xizmeta oryantasyonê ji bo dêbav/welî, zarok û xebatkarên me dikin û lêbelê ew dikarin hindik bên guherandin.

| Dem | Herika rojê |
| --- | --- |
| ________ | Hatin û bi hev re lîstin |
| ________ | Zarokên hortê diçin dibistanê |
| ________ | Taştê |
| ________ | Zarok li komên hêlînê dilîzin, hîn dibin, wêneyan boyax dikin, har dibin, dikenin, diçin gerê û gelek tiştên din |
| ________ | Bêhndana fêkiyê |
| ________ | Zarokên hortê tên cem me |
| ________ | Navroj/xwarina nîvro |
| ________ | Bêhnvedana nîvroyê û çalakî ji bo zarokên ku ranakevin |
| ________ | Xwarina berêvar |
| ________ | Bi hev re lîstin û dêbav zarokan dibin malê |

Bi hev re destpêkirina rojê pir girîng e, loma divê hûn zarokê/a xwe heta saet ________ an bînin helînê.

Hûn ê di peymana me de, demên birin û anîna zarokan bibînin. Dema anîna zarokan di ________ an de û dema birina zarokan herî dereng heta saet ________ e.

Ger kesên din wek dêbav/welî zarokê/a we bigirin, di her hal û kar de wekaletname pêwîst e. Divê hûn vê kaxizê tijî bikin, îmze bikin û bidin helînê. Ji kerema xwe re kesê ku we jê re wekaletname daye, jê re bêjin, ku gava ew zarokê/a we digire, gere nasnameya xwe ya bi fotograf (bo nimûne pasaport, BÜMA, ajotname û wekî din) nîşan bide.

→ Wekaletnameyek pêvekirî ye. Ji bo we zêdetir hejmar hewce bikin, ji kerema xwe re bi birêvebiriya hêlînê, yan jî perwerdekarên zarokên xwe re bipeyivin.

